Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1255 | 12-Adar-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# ‘Stranbêjî derman û rehetiya canê mirov e’



**Dîlan Mulhim\ Qamişlo**

**Stranbêjê kurd Mêrvan Zîbar diyar kir ku bi riya muzîkê ew êş û derdê xwe jibîr dike, hezkirnineke wî a mezin ji stranbêjiyê re heye û wiha got: “ Stranbêjî derman û rihetiya canê mirove”**

Rojavayê Kurdistanê bi hunermendên xwe dewlemend e, bi taybet ciwan. Yek ji wan hunermendê Rojavayê Kurdistanê ku huner û nameya xwe belavî her derê dike. Mêrvan Zîbar e.

### Kurte jiyan Mêrvan Zîbar

Stranbêjê kurd Mêrvan Zîbar di sala 2003`an de li gundê Mehmela ê bajarê Efrînê ji dayîk bûye, herwiha piştî ku Efrîn hate dagirkerin koçberî Şahbayê bû û niha li Helebê jiyan dike. Di heman demê de ew Zanista Rêveberiyê li zanîngeha bajarê Helebê dixwîne.Mêrvan Zîbar ji pêncsaliya xwe dest bi karê dengbêjiyê kiri ye,dema ku wî dest bi karê dengbêjiyê kir bi temenekî pir biçûk bûm û li hunera Efrînê 7`salin muzîk xwend, herwiha di malbatê de dayîk û bavê wî piştgirtî didan û bi taybet bavê wî ji ber ku bavê wî jî gelekî ji stranbêjiyê hezdikir. Herwiha wî hunera bajarê Helebê di xwend lê ji ber pirsgirêkên kesayetî wî dest jê berda, lê ji ber hezkirina wî ji muzîkê re karê xwe yê muzîkê berdewam kir. Herwiha dema ku ew ji Efrînê koçber bûn pir êş û zehmetî di jiyana xwe de kişandin. Lê bi riya muzîkê ew êş û zehmetiyên xwe ji bîr dikim, ji ber vê yekê muzîkê ji bo gelekî bi qîmet e.”

Di derbarî muzîk û pirojeyên xwe de stranbêjê kurd Mêrvan Zîbar ji Rojnameya me re axivî.

### ‘Awaz û stranbêjî aramiya cane mirov e’

Mêrvan Zîbar da zanîn ku muzîk û stranbêjî ji bo wekî heyvekê di şev reşiyê de ye û wiha got: “Mirov bi riya muzîk û starbêjiyê derdê xwe jibîr dike, herwiha muzîk ji bo min jiyane, ji ber ku mirov bi riya stranbêjiyê hestê xwe tîne ziman. Herwiha dema ku mirov ji tiştekî xemgîn dibe li muzîk guhdar dike.Ji ber ku awaz û stranbêjî aramiya canê mirove, herwiha ez tevîl bernameya hunermend Sefqan Orkêş bûm û min gelek stran bi mamoste Sefqan re gotine. Ez tevlî Newroza 2021`ê bûn û stranên dengbêjiyê gotin, di heman demê de gelek stranên min ên dengbêjî li ser bajarê Efrînê hene û 6 stranên min hene di demên pêş de ez ê bikim 4 kilîp, herwiha ez hazritiya kilîpa nû jî dikim. Silavê min ji tevahî gelê Rojava re heye û bi taybet gelê Efrînê û ez bi hêvî me ku gelê rûpelên min bişopînin.”

# Di bin tabloya Pîcasso de sirrek veşartî

**Navenda Nûçeyan**

**Dîroknasên hunerê, keşf kirin ku di bin tabloya Pablo Pîcasso ya bi navê “Portreya Mateu Fernández de Soto” ku di sala 1901’ê de çêkiriye de porteya jinekê ya veşartî heye.**



Dîroknasên hunerê, keşf kirin ku di bin tabloya Pablo Pîcasso ya bi navê “Portreya Mateu Fernández de Soto” ku di sala 1901’ê de çêkiriye de porteya jinek a veşartî heye.

Ev keşif, bi saya teknîkên rontgen ên li Geleriya Courtauldê hatin kirin derket holê. Analîz, nîşan didin ku porê jinê hatiye topkirin, ser milê wê xwar û tiliyên wê diyar in. Tê zanîn ku Pîcasso di salên bohem ên li Parîsê de bi armanca teserufê, li ser tuvalek çend caran wêne çêkiriye. Ev tablo, Serdema Şîn a hunermend nîşan dide û ji be întihara hevalê wî yê nêz Carles Casagemas şêweyek melankolîk nîşan dide. Vê portreya veşartî ya hatiye keşfkirin, li ser xebatên destpêkê û merheleya hunera Pîcasso agahiyên nû dide. Berhem di navbera 14’ê Sibat – 26’ê Gulana 2025’an de dê li Galeriya Courtauld were pêşandan.



Bi kamîreya Narama Mihemed

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER LEWAZÎ Û BÊXWEDÎTIYÊ**

**Berdîberdan e:**
- Her yek tiştekî jê dibe; mîrate ye; malê xêrê ye.

Ber li cer ket wey li cer, cer li ber **ket wey li cer:**
- Tişta nazik û lewaz her ew zererê dibîne.

**Ber li cer ket wey li halê cer, cer li ber ket wey li halê cer:**
- Bi heman wateyê.

**Civanê çûkan li nava garisê Meman e:**
- Ji ber ku lewaz dibînin bi ser de diçin; ji ber ku bêxwedî dibînin li dijî wî li hev dikin da tiştekî bînin serî.

**Kê kir, kê nekir, sêwiyê bêdêbav kir:**
- Dema tişteke xirab tê kirin û diavêjin stûyê yekî bêxwedî, yan lewaz hingê tê gotin.

**Kê tir kir, xerîbê gund kir:**
- Kesê bêxwedî be her kes dikare sûcdar bike.

**Kê tir kir, yên bê dê û bav:**
- Bi heman wateyê.

**Maye li wan navan:**
- Maye bêxwedî.

**Ne li ber pifekê ye:**
- Ji bo kesê pir lewaz tê gotin.

**Pezê bêşivan e:**
- Bêxwedî ye.

*Gundê me pir xweş e lê ti kes nîne lê xwedî derkeve; pezê bêşivan e.

**Piştvala ye:**
- Bêkes e; kesekî ku pişta wî bigire nîne.

**Silha çûkan li ser garisê Meman e:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER KAR Û QEZENCÊ**

**Bi berekî du kêl dan erdê:**
- Bi kiryarekê çend tiştan bi dest dixe.

**Bi berekî sê kêlan werdigerîne:**
- Bi heman wateyê.

**Bi tîrekê li du nîşanan xist:**
- Du kar bi hev re kirin.

**Bi tîrekê du çûk hildan:**
- Du kar bi hev re kirin; du tişt bi hev re bi dest xistin.

**Coya biav qiraxên xwe şil dike:**
- Ku tişteke baş li nêzî mirov hebe hindik jî be wê sûdê jê bigire.

**Çûkan li ser davên wî daniye:**
- Hindik maye qezenceke mezin bi dest bixe.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Pêwîst e rêxistinên mafê mirovan nebin hevkarên qirkirinê’



Rêveberiya Komeleya Mafê Mirovan ya Sûriyê Evîn Cuma diyar kir ku komên çekdar ên cîhadîst ku girêdayî desthilatdariya Şamê ne, li dijî elewiyan komkujiyan pêk tînin û wiha got: “Pêwîst e rêxistinên mafê mirovan nebin hevkarên zordariyê.”**R-3**

## 12’ê Adarê roja serhildana gelê kurd li dijî zordariyê bû

12 Adara 2004’an gelê kurd li dijî zordariya rêjîma Beis serî hilda. Lîstikvan Qezafî Usmet da zanîn ku roja 12’ê Adarê ji bo gelê kurd rojeke xemgîn e û got, “Rêjîmê Beis qirêja siyaseta xwe xist nav giyanê sporê de û xwest fitneyekê di navbera kurd û ereban de çêke.”**R-4**



## 11’emîn salvegera komkujiya Şaredariya Bajarê Qamişlo




Bi armanca şikandina Rêveberiya Xweser, îradeya gelan û hilwişandina aramiya herêmê, di 11`ê Adara 2014`an de çeteyên DAIŞ`ê Şaredariya Gel a Bajarê Qamişlo kirin hedef û di encamê de 11 xebatkar û lêvegerînên li şaredariyê şehîd bûn.**R-6**

## ‘Bi hevgirgtina hêzên siyasî û rewşenbîrî em ê mohra xwe li sedsalê bixin’




Berdevkê fermî yê Hevgrtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê Munîr Şêxê diyar kir ku ji bo pêşxistina xebatên rewşenbîrî, sîwanek ji 5 yekîtiyên rewşebîran re hat avakirin û wiha got: “Di demên nêz de wê civîneke yekîtiyên rewşenbîrî bi mebesta nivîsandina nexşeriyekê were lidarxistin.**R-7**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1255 | 12-Adar-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# JIN GERDÛN E

Rêber Apo di 27’ê Sibatê de li gor ruhê serdemê manîfestoyeke bi navê ‘Banga Aştî û Civaka Demokratîk’ bi raya giştî re parve kir. Banga Rêber Apo ji bo hemû gelan bû hêviyeke mezin. Di 8’ê Adarê de jî nameyek bi serenavê ‘Destûra min a bingehîn, bi we re jiyaneke efsûnî ye!’ ji bo jinan şand. Jin bi peyama Rêber Apo re soza xurtkirina têkoşîna wekheviyê dan. Herwiha jinan dan zanîn ku têkoşîna wan a ji bo azadiya fizîkî ya Rêber Apo dê ji her demê mezintir be.**R-2**











## ‘Bi guhartina hevsengiya sedsalî divê Tirkiyê pêvajoya nû qebûl bike’

Endamê Kongra Îslama Demokratîk Ebdulkerîm Saroxan da zanîn ku peyama Rêber Abdullah Ocalan ya aşitî û demokrasiyê pêvajoyekî nû di dîroka Tirkiyê de dide destpêkirin û divê Tirkiyê li gorî guhartina dengeyên sedsalî xwe saz bike.**R-5**


**Kujerên berê û niha di zihniyetê de yek in!**
Dilyar Cizîrî R-4


**Niyetên Xirab**
Farûk Sakik R-5


**Li dijî demogojiyê têkoşîneke bîrdozî ya bibandor pêwîst e**
Zekî Bedran R-5


**Rewşenbîrên Rojava ji bo rewakirina parçebûnê li hev civiyan**
Kemal Necim R-7

# ‘Bi peyama Rêber Apo re erka jinê girantir bû’

Berpirsyara Komîteya Pêwendiyan a Kongra Star Emîna Osê diyar kir ku heya azadiya Rêber Apo a fîzîkî pêk neyê, ew ê her asta tekoşînê bilind bikin û got, “Bi wesîleya 8’ê Adarê wê têkoşîna me ya li dijî dagirkeriyê û hêzên hegomon, herwiha li hemberî hêzên desthilatdar mezintir û xurtir bibe.”

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Peyama Rêber Apo a ku bi Banga ‘Aştî û Civaka Demokratîk’ di heman demê de ji bo jinan Ronesans e. Rêber Apo di peyama xwe wiha got ‘jinên ku guh didin banga min, bawerî bi jiyana hevpar tînin bi eşqa Mem û Zîn, bi eşqa Derwêşê Evdî ya nûjen silav dikim û 8’ê Adarê pîroz dikim.’ Di 8`ê Adarê de Roja Jinên Cîhanê yên kedkar, peyamên Rêber Apo hat xwendin. Lewma 8`ê Adara vê salê ji bo tevahî jinan û bi taybet jina kurd pir bi wate û girîng bû. her wiha jinan peyama Rêber Apo wekî pêşeroja jiyanê, têkoşîn, berxwedan û azadiyê dîtin. Ne tenê 8’ê Adarê, hemû rojan vediguherînin rojên têkoşîn, berxwedan û azadiyê.

Têkildarî coş û kelecana 8`ê Adarê, di heman demê de li ser peyama Rêber Apo a 8`ê Adarê Berpisiyara komîteyên Pêwendiyan a Kongra Star Emîna Osê ji Rojnameya me re axivî.

**‘Peyama Rêber Apo coş û moralekî pir mezin da’**

Emîna Osê di destpêka axaftina



xwe de wiha got: “Roja 8`ê Adarê wekî ku tenê rojeke em dest nagirin, bi boneya cejina 8`ê Adarê li tevahî jinên kedkar, bi taybet yê kurd û jinên ku bi salane têkoşîn û berxwedaniyeke bê hempa ji bo azadî û mafê xwe şer dike, em li wan pîroz dikin. Bê guman coş û morala 8`ê Adara vê salê ji salên din cudatir bû, wek tê zanîn ku her 8`ê Adarê nêz dibe em wekî hemleyekî destpêdikin, her wiha ev hemle jî bi civîn, kom civîn û çalakiyan cur bi cur, hem civakî, siyasî û rêxistinî ji bo zanista jin hîn bihtir pêşbikeve, em li dar dixin. Di heman demê de li kêleka van çalakiyan û kar û xebatan, ev bi salaye bi hêviya mizgîniya ku ji Rêberê mirovahiyê Rêber Apo bibhîsin e. Coş û morala 8`ê Adara vê salê bi peyama Rêber Apo hat xemilandin û bi kelecanekî pir mezin jin tevlî cejinê bûn, tenê xwestin bizanibin wê Rêber Apo çi bêje wan û ji niha û şûnde pêwîsta jin çi gavî bavêje.”

**Pîrozbahiya Rêber Apo erka li ser jinê girantir kir**

Emîna Osê di berdewamiya axaftina xwe de palkişand ser peyama Rêber Apo a ku di 8`ê Adarê de hat xwendin û wiha nerxand: “Rêber Apo di peyama xwe de got ku “pirsgirêka jinê ji pirsgirêka Kurd kûrtir e. Pirsgirêkek bi vî rengî heye. Di vî warî de me destpêkeke biçûk pêk anî. Çanda şer û pevçûnê herî zêde li dijî jinan dimeşe. Têkbirina vê çandê dînamoya têkoşîna me ye. Ruhê vê serdemê siyaseta demokratîk e, zimanê vê serdemê jî zimanê aştiyê ye. Banga “Aştî û Civaka Azad” di heman demê de ji bo jinan Ronesans e. Ez jinê ku guh didin banga min, bawerî bi jiyana hevpar tînin bi eşqa Mem û Zîn, bi eşqa Derwêşê Evdê ya nûjen silav dikim”

Ev peyam jî bal kişand ser rola jin di nava civakê de û girîngiya wê çiye?, ji ber vê yekê jin civake û çiqas ew civak azad bibe ewqas sîstema demokiratîk bi hêz dibe û bandorekî mezin li ser civakê pêktîne. Her wiha gelek mijarên girêdayî sîstemên heyî yên ku çareseriyê ji pirsgirêkên jinê re nayên dîtin, wekî sîstemên netewdewlet li ser bingihê olî yan netewparestî ne, ev hemû di bin zehniyeta xwe de ya zayendparestî êriş li ser jinê didin meşandin, ev jî ji bo jinê xeteriyeke pir mezine. Ji ber vê yekê erka jin pêwîste ji wiha girantir be, di hemû aliyan de xwe pêşeng bibîne, asta tekoşîn û berxwedanê bilindtir bike.”

**‘Bi biryardayinekî xurt em ê asta têkoşînê bilind bikin’**

Berpisiyara Komîteyên Pêwendiyan a Kongra Star Emîna Osê di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Pêwîste tevahî jin li bangewaziya Rêber Apo xwedî derkevin, di heman demê de pêwîste bi hemû hêza xwe ji bo demokrat kirina civakê hîn zêdetie bixebite. Ya esas ew e ku divê bi ferasetê şer bê kirin. pergala civakî ya mêrên serdest her tim ji bo jinan pirsgirêkan diafirîne. Tundî heye, dagirkerî heye, destdirêjiya zayendî heye û hwd.. Divê em bi vê çand û ferasetê re şer bikin. Rêber Apo dibêjie ‘Di vî aliyê de kêmasî û nakokiyên we hene, xwe ji van kêmasî û nakokiyan rizgar bikin’. Ji ber vê yekê pêwîste em xwe ji hemû nakokî û kêmasiyan qezanc bikin, ew jî bi hêza ku Rêber Apo dide me em xwe rizgar bikin û maf û azadiya tevhî jinan mesoger bikin.

Di herî dawiyê de dîsa em dibêjin ku 8`ê Adara vê salê ji bo tevahî jinan pir cuda bû û bi biryardayinekî pir xurt asta têkoşîna xwe wê bilindtir bikin. Her wiha heta Rêber Apo bi fîzîkî azad nebe em ê vê têkoşînê nedin sekinandin. Bi wesîleya 8’ê Adarê wê têkoşîna me ya li dijî dagirkeriyê û hêzên hegemon, li hemberî hêzên desthilatdar mezintir û xurtir bibe. Çiqas em têkoşîna xwe mezintir bikin em ê ewqas bikaribin hêzên beramberî xwe lawaztir bikin. Ev têkoşîn bi şêwaza perwerdekirina civakê wê pêk were. Divê em li şûna tiştên ku hêzên hegemon di nav civakê de dane rûniştandin, felsefeya Rêber Apo bidin bicihkirin û wê ev jî bi têkoşîna me ya jinan were misogerkirin.”

# Destûra min a bingehîn, bi we re jiyaneke efsûnî ye

Ez di ferqa vê yekê de me ku, li ser xaka xwebûnê hûn rastiya miroviyê bi her awayî dijîn. Hûn jinên xwedî nirxên efsûnî, min tu caran dev ji jiyana bi we re berneda. Ev jiyana bi vî halî, bû rista bingehîn ku min li ser piyan digre. Lê, rastiya ku cara yekem ewqas bi heybet û azad e, wê bi qasî pêşînên din ên Mezopotamyayê bi heybet be. Belkî jî ev yek pêk hatibe. Meseleya azadiya jinê hêj jî girîngiya xwe diparêze. Pêvajoya komunalîst a demokratîk rewşa nûjen a civakbûyîna jina pêşeng e. Bidestxistina rastiya civakî jî encax bi vê rêbazê mumkun e. Heya ku çanda tecawizê/destdirêjiya zayendî têk neçe, di qadên zanistî, estetîk û olî de heqîqeta civakî jî dernakeve holê. Wekî ku ji Marksîzmê jî hat îsbatkirin, heya ku çanda serdest a mêr di kûrahiya civaka serdema nû de neyê fetisandin, serkeftina sosyalîzmê ne mumkun e. Rêya sosyalîzmê ji azadiya jinê derbas dibe. Heya ku azadiya jinê pêk neyê hûn nikarin bibin sosyalîst. Sosyalîzm pêk nayê. Heya ku demokrasî



nebe sosyalîzm jî nabe. Azmûna min a yekem a bi sosyalîzmê re, bi şêwaza axaftina bi jinekê re diyar bû. Kesekî ku nizanibe bi jinekê re çawa biaxive, nikare bibe sosyalîst. Sosyalîsbûyîna mêrekî bi peywendiya wî ya bi jinekê re girêdayî ye.

Pîrozî ya jinê ye. Jin bi xwe gerdûn e. Mêr jî gerestêrkeke rêderketî ya derdora vê gerdûnê ye. Ji bo cara yekem bang li zarokê bike ya ku ziman afirand jin e. Afirînera çandê jin e. Afirînera civakê jî jin e. Pirozî û Xwedawendî jî ya jinê ye. Ji bo jinan min bîrdoziya rizgariya jinan a ku ji çar qadan pêk tê, pêş xist. Ev teorî ye. Çanda jina pêşeng, serdema xwedawendayan di navbera Beriya Zayînê 10 hezar sal û 4 hezar salan de ye. Olên yek xweda bi Babîlê destpêdikin. Destana Babîlê destana kolekirina jinê ye. Afirandina destana Babîlê yek ji hîmên bingehîn a mîtolojiya Mezopotamyayê ye. Di navbera salên beriya zayînê 4 hezar û 2 hezar salan de ji bo çanda jinê têkçiwîn destpêkir. Piştî ku çanda jina pêşeng hilweşiya, bi Mîtanîyan ve jina qesrê derket holê. Nefertîtî jî jineke ji qesrê ye. Jinên qesrê yên wê serdemê di pêvajoya dîrokî de bûn jinên ji malê yên vê serdemê.

Wekî ku hûn jî dizanin, çand û kevneşopiya Satî heye. Di çanda Satiyan de jin davêtin nav agir û dişewitandin. Di salên 1832’yan de jî ev yek pêk dihat. Piştre, Îngilîzan dawî li vê çandê anîn.

Vejîna ku wê ji nû ve pêk bê gelek girîng e. Divê jin ne di warê biyolojîk de, divê di warê çand, civakî û dîrokî de bê nirxandin. Wekî ku Simone De Beauvoir jî dibêje; jin ne ji zayînê ye, ji hebûnê ye. Ez ne dijberê evîn û zewacê me. Lê, her roj li ser navê evînê cînayetên gelek hov pêk tên. Kesekî evîndar çawa evîna xwe dikuje? Ev ne evîn e. Heya niha gelek jin ji ber peywendiya bi vî rengî întîhar kirin. Her wiha, çanda azad a jinê heye. Asta ku hatî hûn nêzî vê çandê ne. Jin hewl didin derkevin derveyî sînorên dayikbûyîn û hevjînbûyînê. Lê, hêj jî hûn encax ji sedî 10’ê çanda azad a jinê îdare dikin. A esas ew e ku, divê bi ferasetê şer bê kirin. Pergala civakî ya mêrên serdest her tim ji bo jinan pirsgirêkan diafirîne. Tundî heye, dagirkerî heye, ensestî heye, destdirêjiya zayendî heye, îhtîmala kuştina zarokên keç heye. Di pêşerojê de zarok bên kuştin hûn ê çi bikin? Dema ez behsa çanda Satî dikim, ez balê dikşînim ser vê rastiyê. Divê hûn bi vê çand û ferasetê re şer bikin. Di vî warî de kêmasî û nakokiyên we hene, xwe ji van kêmasî û nakokiyan rizgar bikin.

Pirsgirêka jinê ji pirsgirêka Kurd kûrtir e. Pirsgirêkek bi vî rengî heye. Di vî warî de me destpêkeke biçûk pêk anî. Çanda şer û pevçûnê herî zêde li dijî jinan dimeşe. Têkbirina vê çandê dînamoya têkoşîna me ye. Ruhê vê serdemê siyaseta demokratîk e, zimanê vê serdemê jî zimanê aştiyê ye. Banga ‘‘Aştî û Civaka Demokratîk’’ di heman demê de ji bo jinan Ronesans e. Ez jinên ku guh didin banga min, bawerî bi jiyana hevpar tînin bi eşqa Mem û Zîn, bi eşqa Derwêşê Evdê ya nûjen silav dikim û 8’ê Adarê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê pîroz dikim.

**Bi silav û hezkirinên xwe yên dayîmî**
**Abdullah Ocalan”**



# ‘Bi hevgirgtina hêzên siyasî û rewşenbîrî em ê mohra xwe li sedsalê bixin’

Berdevkê fermî yê Hevgrtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê Munîr Şêxê diyar kir ku ji bo pêşxistina xebatên rewşenbîrî, sîwanek ji 5 yekîtiyên rewşebîran re hat avakirin û wiha got: “Di demên nêz de wê civîneke yekîtiyên rewşenbîrî bi mebesta nivîsandina nexşeriyekê were lidarxistin. Karê hevbeş girîngiya dîmena rewşenbîrî ye.”

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

5 yekîtiyên rewşenbîrî di 7’ê Adarê de, Dîdareke Giştî ya Nivîskar û Rewşenbîrên Kurd li Rojavayê Kurdistanê, li bajarê Qamişlo li dar xistin.

Armanca dîdarê sîwaneke giştî ya yekîtiyên rewşenbîrî were avakirin

Di Dîdara Gistî ya Nivîskar û Rewşenbîrên Kurd li Rojavayê kurdistanê de ji bo Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyê, Yekîtiya Giştî Ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê, Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê, Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Cizîrê û Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê komîteyeke hat avakirin. Armaca vê dîdarê ew bû ku sîwaneke giştî ya van her 5 yekîtiyan were avakirin. Herwiha bi armanca yekkirina yekîtiyên reşwenbîrî, çêkirina lêvegereke ji bo tevahî rewşenbîr û nivîskaran. Da ku bi hev re derxistina daxuyaniyan û xebatekî rewşenbîrî bidin meşandin. Roleke mezin di qada siyasî û civakî de bilîzin. Herwiha di dîdarê de li ser 3’ê mijaran hatibû nîqaşkirin.

**Mijarên ku di dîdarê de hatibûn nîqaşkirin wiha ne:**

Mijara yekemîn: Rola rewşenbîrên kurd di vê pêvajoyê de, li hember gotara nefretê û rola wan a civakî li ser asta Sûriyê bi giştî û kurdî bi taybet.

Mijara duyemîn: Rola Yekîtiyên nivîsakr û rewşenbîrên kurd di danîna nexşerêya xebata hevbeş de.

Mijara sêyemîn: Rola rewşenbîrên kurd di piştgriya hewlên ji bo yekkirina gotar û helwesta kurdî û avakirina lêvegerek siyasî ya kurdî ya berfireh hate nîqaş kirin.

**Dîdar bi raghandina encamnameyê bi dawî bibû. Encamname jî wiha ye:**

-Pêwîst e ku rewşenbîr bi rola xwe ya ronakbîrî li gel rola xwe ya niştimanî û neteweyî rabe. Ji ber ku ew nûneriya manewî ya wijdanê komî ya gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê û hemû beşên Kurdistanê dike.

-Dûrketina ji hemû sedemên ku





nakokiyê di nava civaka kurdî de çêdike. Herwiha ji hemû awayên gotara kîn, tundî û nefretê û binpêkirina aştîya gelêrî di civaka kurdî û Sûrî de.

-Piştgirî û alîkarîya hemû hewldanên yekkirina gotar û helwesta kurdî di navbera aliyên tevgera siyasî ya kurdî de. Da ku bigihêjin avakirina lêvegereke giştî ya kurdî ku nûneriya daxwazên rewa ên gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê destnîşan bike.

-Piştgiriya Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) dijî êrişên Tirkiyê û çeteyên wê yên ku Rojavayê Kurdistanê û Bakur-Rojhilatê Sûriyê armanc dikin.

-Nûnerî û tevlîkirina jinê di hemû saziyên siyasî, çandî, civakî û aborî de bi awayekî dadwer û li gor bingehê jêhatîbûn û pîşeyî.

-Tekezkirina beşdariya ciwanan a aktîv di hemû çalakiyên çandî de.

-Peydakirina jîngeh û hawîrdorek guncaw ji bo rêxistinkirina çalakiyên çandî bi hev re.

-Biryardayîna avakirina komîteyeke hevbeş ya giştî ji bo hemû rewşenbîr û nivîskarên kurd li Rojavayê Kurdistanê ku bibe lêvegereke giştî. Avakirina komîteyek ji yekîtiyên rewşenbîr û nivîskarên kurd da ku roleke çalak di hemû dîdar û çalakiyên li hinder û derveyî welat bilîze.

Derbarê Dîdara giştî ya nivîskar û rewşenbîrên kurd li Rojavayê Kurdistanê, berdevkê fermî yê hevgrtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê Munîr Şêxê ji ronameya me re axivî.

Munîr Şêxê diyar kir ku li gorî rewşa Rojavayê Kurdistanê hebûna 5 yekîtiyan rewşeke ne tenduriste û wiha got: “Pêwîstiya vê dîdarê ew e ku hem rewşa Rojavayê Kurdistanê ku tê de 5 yekîtiyên rewşenbîr û nivîskaran hebe, rewşeke ne tenduriste, ji ber ku rewş bi giştî awarteye, hem li Rojava û Sûriyê ev yekîtî rû dan li ser dîmena rewşenbîrî. Lewra me xwest berî her tiştî ku em karibin dîdarekê li dar bixin. Da ku rewşa Rojavayê Kurdisatanê û taybet Sûriyê piştî guhertina rejîma Baas giftigo bikin. Ya din jî em nebêjin em weke rewşenbîr bibin yek, ji ber ev gava yekîtiyê xebat jêr gerek e. Lê em weke sîwaneke giştî çê bikin ku karibin di bin siya wê de karê xwe yê rewşenbîr bi rengekî giştî bikin. Li ser vê bingehê her 5 yekîtî li hev rûniştin û biyar dan ku di destpêkê de komîteyekê ava bikin, ev komîte her 5 yekîtiya temsîl bike û karê hevbeş di nav de bê kirin. Herwiha lêvegereke çandî û rewşenbîrî be.”

**Wê civîneke yekîtiyên rewşenbîrî bi mebesata nivîsandina nexşeriyekê were lidarxistin**

Munîr Şêxê eşkere kir ku wê civîneke giştî ya yekîtiyên rewşenbîr û nivîskarên Rojavayê Kurdistanê were lidarixistin û wiha got: “Piştî ku komîteya rewşenbîr û nivîskaran hate damezrandin, em ê civîneke giştî lidar bixin. Civîn wê girêdayî komîteyên rêvebir ên van saziyan be. Da ku em ji xwe re nexşeriyekê binvîsînin û di rêya wê de çalakiyên xwe yên rewşenbîrî bikin yek, herwiha dema xelat jî hebin, bibe yek xelat. Ev civîn wê di demên nêz de bên lidarxistin û wê xetên sitûr di nava civînê de werin nîqaşkirin ku yekîtiya rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê bibe weke laşekî bi hev re dixebite. Dibe ku ne yekîtiyeke yekgirtî be û saziyên xwe çareser bikin. Lê karê hevbeş ew ya herî girînge di dîmena rewşenbîrî de.”



**‘kesên di Sûriyê de dixwazin nûnerên kurda di dîmena siyasî de nebin’**

Munîr Şêxê da zanîn ku avakirina yekîtiyên rewşenbîrî birêkûpêkirina xebatên rewşenbîr ye û wiha got: “Dema yekîtiyek ji her 5 yekîtiyên rewşenbî yên Rojavayê Kurdistanê re were avakirin, wê demê xebatên rewşenbîrî bêtir birêkûpêk dibe. Herwiha ji kesekî dervere ku qada rewşenbîrî dişopîne, gava ku bibîne rewşenbîrên kurd bi taybet li Rojavayê Kurdistanê di bin sîwanekê de kar dikin, wê ji wan re bibe cihê hêzê. Ev komîteya rewşenbîrî jî ya ku hatiye avakirin nûnertiya her 5 yekîtiyan li hundir û derveyî Rojavayê Kurdistanê bike. Herwiha piştî ev guhertina ku di 8’ê Berfanbarê de li Sûriyê de hate çêkirin, me dît ku kesên di Sûriyê de dixwazin nûnerên kurda di dîmena siyasî de nebin û bêtir ew gotara kîn, gef û reşkirinê li hemberî kurdan dan meşandin. Lewra pêwîstiye mezin bi yekrêzî, yekîtî û bi yek hewlestê di qada rewşenbîr û bi taybetî ya siyasî heye. Ji ber ku qada siyasî bêtirî xwe nûnertiya vî gel di warê pêdivî û dawazên gel ê siyasî, civakî û çandî bi kesên desthilatdar re ku Sûriya pêşerojê birêve dibin, bike.”

**‘Bi hevgirgtina hêzên siyasî û rewşenbîrî em ê mohra xwe li sedsalê xin’**

Munîr Şêxê axaftina xwe wiha qedand: “Ji bo yekbûyîna rewşenbîran me gav avêt û hêvîdarin tevgera siyasî jî gavekê wek a me bavêje. Ji ber ku yekgirtina hêza siyasî, leşkerî û rewşenbîrî temsîla gel e. Gava civaka kurdî, rewşenbîrên kurd, siyasetmedar û hêzê kurdî yên siyasî QSD’ê yekgirtî bin, ez bawerin wê demê em ê mohra xwe li sedsala nû bixin.

## Têbînî



**Rewşenbîrên Rojava ji bo rewakirina parçebûnê li hev civiyan**

Kemal Necim

Di deh salên dawiyê de, piştî ku destên rejîma Baasê ji ser Rojavayê Kurdistanê rabû û rewşa qedexe û çewisandina li ser çand û zimanê kurdî rabû, liv û tevgera rewşenbîrî jî li herêmê geş bû.

Ji bo birêxistinkirina kar û barên rewşenbîrî jî gelek sazî, dezgeh û yekîtiryên rewşenbîr û nivîskaran çêbûn. Bi awayekî diyar perçebûn û dubendiya siyasî bandora xwe li qada rewşenbîrî kir, lewma halê hazir 5 yekîtiyên rewşenbîr û nivîskaran li Rojava hene, hinek ji wan çalak in, hinekî salê çend çalakiyan li dar dixin, lê bi giştî van saziyan hemûyan bi hev re liv û tevgereke rewşenbîrî li herêmê çêkir.

Di pêvajoya deh salan de erk û delametên saziyên rewşenbîrî pêşxistin û geşkirina çand û wêje û kelpûr û ramanê bû, her wiha birêvebirina kar û barên kesên ku bi van mijaran mijûl in. Heta radeyekê van saziyan (kêm zêde) erkên xwe dikirin, bi taybet piştî salên dirêj ên çewisandin û qedexeyê, lewma mirov dikarîbû çavên xwe li rewşa parçebûn û belavbûna tevgera rewşenbîrî bigire.

Di sala derbasbûyî û bi taybet di çend mehên derbasbûyî de geşedanên pir lezgîn û awarte li tevahiya Rojhilata Navîn û Sûryeyê çûbûn, van geşedanan bi awayekî rasterast bandoreke mezin li herêmên Rojava kirin ku mijara siberoja kurdan li vî welatî kete rojeva civaka kurd de. Arîşe û mijarên ku herî zêde xwe li ber kurdan raxistiye ku çawa karibin ji her hêlê de xwe ji rewşa parçebûn û belavbûnê rizgar bikin û bi qasî ku dikarin xwe li hev ragirin, nêzî hev bibin.

Yek ji van qadên ku divê xwe bide ser hev qada tevgera rewşenbîrî ye. Eger rewşenbîrên kurd ên li Rojava bi rastî dixwazin bibin egera yekrêziya mala kurdan û di nava hewldanên yekîtiyê de xwedî roleke bi bandor bin, divê pêşî ew mala xwe bidin ser hev û nêzî hev bibin. Êdî dem hatiye ku li şûna 5 saziyan tenê saziyek hebe.

Berî çend rojan di çarçoveya hewldanên nêzîkirin û yekirina saziyên nivîskar û rewşenbîran de, 5 yekîtiyên nivîskar û rewşenbîran banga dîdareke giştî kirin. Bi dehan rewşenbîr û nivîskar beşdar bûn.

Di beşa girêdayî mijara yekrêziya saziyên rewşenbîran de, pir diyar bû ku ne kesayet ne jî saziyên rewşenbîran ji bo bibin yek amade ne.

Ango mirov dikare bêje ku qada rewşenbîrî li Rojava hayê wê ji guherîn û geşedanên li dinyayê çêdibin tune ye, her wiha hayê wan ji rola wan û erkdarî û delametên wan jî tune ye. Beşdaran bi piranî xwe li ser mijara sereke çem kirin. Li şûna danîna planeke diyar bo yekirina tevgera rewşenbîrî, mijara çalakiyên hevbeş gotûbêj kirin. Ango carê daxuyaniyek hevbeş bidin an şevbuhrkeke helbestan a hevbeş li dar bixin û HWD.

Kar û xebatên hevbeş bijarteyeke xerab e, lê ji bijarteyên xerab ya herî baş e. Bijarteya rasteqîn û durist ew e ku 5 yekîtiyên rewşenbîran îro berî sibê xwe betal (hel, fesix) bikin, banga kongreyeke giştî bikin û ji nû ve saziyeke xwe ya berferh ava bikin. Ji bilî wilo hemû bijarteyên din ên wekî kar û çalakiyên hevbeş wê bibe çesipandin û rewakirina rewşa belavbûn û parçebûnê.

# Mîmarê projeya azadiya jin Rêber Apo ye

Endama Komîteya Aborî ya Kongra Star a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rozerîn Bekir diyar kir ku bi hatina 8 Adarê re nameya Rêber Apo ji bo her jinekê tê wateya tekoşîn û berxedaniyê û got, "Mîmarê projeya azadiya jin Rêber Apo ye."

**Tekoşîn Amara /Qamişlo**

Derbarê girîngiya banga Rêber Apo ji bo tevahî jinan, endama Komîteya Aborî a Kongra Star a Bakûr û Rojhilatê Sûriyê Rozerîn Bekir ji Rojnameya me re axivî.



**'Rêber Apo rêya azadiya jin vekir'**

Rozerîn Bekir di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Rêber Apo bingeha koletiya jin, ji ku tê, bi awayek pir vekirî analîz dike.Dema em li dîroka jin meyze dikin û li gor ku Rêber Apo jî şîrove dike, dîrokeke pir bi êş e. Dîroka jin bi salane ku di tekoşîn û berxwedaniya xwe de tawîz nedaye, hertim di nava tekoşîneke bê hempa de ye. Tu carî xeta tekoşîna xwe nedaye sekinandin. Di dîrokê de hertim dû xet hene; xeta berxwedanî û xeta xwe teslîmkariyê ye. Rêber Apo ji bo dûrişmeya 'jin jiyan azadî' ku niha li giştî cihanê bûye sembola azadiya jin, gelek perspektif û nirxandinan pêşxist. Em Jinên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê jî ew dûrişme ji bo me wek nan û avê ye."

**'Jina azad civaka Azad e'**

Rozerîn Bekir diyar kir ku paradîgma netewa demokratîk a ku civaka azadîxwaz, polîtîk û civakek demokratîk dipejirîne li Bakûr û Rojhilatê Sûriye yê, ew proje bi tamamî ketiye meriyetê û wiha domand:"Rêber Apo û hemû lêkolînerên cîhanê jî didin xuyakirin ku azadiya jinê azadiya civakê ye. Civaka demokratîk pîvanê wê hene; ew civakek ekolojîk, wekhev û demokratîke ku tu cara ferq û cûdahiyê nake navbera jin û zilam de, ew bi awayekî wekhev bi hev re jiyan dikin. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rêveberiya Xweser li ser bingeha pergala netewa demokratîk sîstema hevserokatiyê xistiye meriyetê û jin di tevahiya aqadan de cihê xwe digre û bi rola pêşengtiye radibe. Ev jî bi saya fikir û felsefeya Rêber Apo ku ji jinê re pêşkeş kiriye."

**'Bi saya fikirê Rêber Apo jin xwe birêve dibin'**

Rozerîn Bekir di dewama axaftina xwe de wiha got: "Di sîstema kapîtalîzmê de jî, jin di saziyan de kar û xebatê didin meşandin, lê mixabin di wan saziyan de jî gelek tiştên xirab li ser jin tê meşandin û mafê jinê di asta ku tê xwstin de nehatiye parastin. Di nav sîstema demokratîk de saziyên ku li ser esasê netewa Demokratîk xwe dipejirînin, jin xwe bi xwe rêve dibe û bi lêgerîna xwe kar û xebatê dide meşandin. EV bi saya fikrê Rêber Apo pêk hat."

**'Nameya Rêber Apo ji bo jinan bû hêz'**

Rozerîn Bekir bal kişand li ser nameya Rêber Apo û got wiha got: " Rêber Apo di 27'ê Sibatê de banga ji bo civaka aşitî û demokratîk kir, banga Rêber Apo li Rojhilata Navîn û giştî cîhanê deng vede, di heman demê de bû cîhê keyfxweşiyê. Gelek alî û derdoran li ser asta cîhanê piştgiriya xwe ji banga Rêber Apo re ragihandin. Jinên ku ji bo demokrasiyê tekoşînê dikin li benda peyama Rêber Apo bûn û ji bo wan jî bû cihê kêyfxweşiyê. Bi hatina 8'ê Adarê re nameya Rêber Apo hat xwendin ew jî bû sedema ku bi wî rihê 8 Adarê bi kêyfxweşî û kelecanek mezin bê pêşwazîkirin. Rêber Apo carek din bi nameya xwe ya pîroz û bi wate mohra xwe li dîrokê xist. Di rewşek wiha hasas de ku Rojhilata Navîn û tevahî cîhan tê de derbas dibe, yan em ê ber bi aşitiyek pir mezin ve biçin yan jî em ê şerekî pir dijwar re derbas bibin. Di nav şer de jî yên ku herê zêde dibin hedef jin û zarokin. Pêwîst e sîstemên sermeyadar yên ku dewletan birêve dibin, wekî ku çawa civak bi giştî ew peyam hembêzkirin, ew jî peyama Rêber Apo hembêz bikin û bikin pratîkê, wê demê wê serkeftinên pir mezin ji aliyê aşitiyê ve bên bidestxistin."

**'Jin 8'ê Adarê li mîmarê azadiyê pîroz dikin'**

Rozerîn Bekir axaftina xwe wiha qedand: "Em jin di serî de 8'ê Adarê li mîmarê azadiyê û mîmarê zanista jin Rêber Apo pîroz dikin û soza bilindkirina tekoşîna xwe didin. Meha Adarê ji bo tevahî jinan meheke pîroz û binirx e, roja berxwedan û tekoşînê ye, hemû jin bi yek dengî mil didin milê hevdû û bi xemla xwe ya gelêrî 8'ê Adarê pêşwazî dikin. Li hemû cihan jin derdikevin kolanan û bi felsefeya jin jiyan Azadî bang dikin. Em jin ji bo ku peyam û nêrînên Rêber Apo pêk bînin, ji bo avakirina civake demokratîk û aşitiyane, em ê yekîtiya jinan xortir bikin. Rêber Apo diyar dike ku hê "Dîroka jin nehatiye nivîsandin" em jî wek jinên kurd dixwazin ji nûve mohra xwe li dîrokê bixin da ku laîqê hemû jinên ku pêşengtî dikirin û şehîd bûne. Jinên ku rastê tundiyê hatin û berdel dane heman demê de jinên ku îro di girtîgehan de em ê laîqê wan derkevin û wê tekoşîna me bidome.

# 11'emîn salvegera komkujiya Şaredariya Bajarê Qamişlo

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Bi armanca şikandina Rêveberiya Xweser, îradeya gelan û hilwişandina aramiya herêmê, di 11`ê Adara 2014`an de çeteyên DAIŞ`ê Şaredariya Gel a Bajarê Qamişlo kirin hedef û di encamê de 11 xebatkar û lêvegerînên li şaredariyê şehîd bûn.**

Meha Adarê di nava gelê Kurd de hem meha xemgînî û hem jî ya kêfxweşiyê ye. Ev meh di nava xwe de gelek gelek dîrokên girîng ji bo gelê Rojavayê Kurdistanê di nava xwe de digre. Yek ji bûyerên bi êş ku beriya 11 salan li bajarê Qamişlo rû da, Komkujiya Şaredariya Qamişlo bû. Ev komkujî di 11`ê Adara 2014`an de ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve pêk hat û di nava gelê bajarê Qamişlo de êşeke mezin li pey xwe hişt.

Bi avakirina şoreşa Rojava re Şaredarî hatin avakirin. Wê demê şaredarî li herêmê saziyên sereke bûn ku gel bi rêxistin dikirin û pirsgirêkên wan çareser dikirin. Çeteyên DAIŞ`ê Şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo kirin hedef û derdora 11 xebatkar û lêvegerên li şaredariyê şehîd xistin. Ji ber ku şaredarî nû hatibû avakirin hêzên parastinê lê tinebûn. Ji ber wê jî çeteyan bi hêsanî dikarîbûn derbasî avahiyê bibin.

Di sibeha 11`ê Adara 2014`an de saet derdora 12`an de komkujî li şaredariya Qamişlo hat kirin. Di şaredariyê de nivîsgehên xizmeguzarî hebûn, girêdayî Şaredariya Qamişlo ya navendî a Rêveberiya Xweser li kantona Cizîrê. Sê xwekujan ji çeteyên DAIŞ`ê ku çekên bombe li xwe kirbûn êriş pêk anîn, di encamê de xebatkarên şaredariyê û lêvegerên wê şehîd ketin û hejmareke ji wan birîndar bûn. Di wê demê de çeteyên DAIŞ`ê bi awayekî fermî ev komkujî hilgirt ser xwe.

**Bi çekan xebatkarên şaredariyê kirin hedef**

Çeteyên DAIŞ'ê Berî ku debasî şaredariyê bibin, çavdêrê li ber derî şehîd xistin. Piştre derbasî şaredariyê bûn. Dema derbas dibin şehîd Fehed xwe dide pêşiya wan da ku wan bigre, çeteyek xwe diteqîne û fehed şehîd dikeve.

Çeteyên DAIŞ`ê ketin avahiyê û destpêkê bi çekan xebatkarên şaredariyê kirin hedef, bombe avêtin odeyan û mayînên li ser xwe teqandin. Di vê êrişa hovane de, Îbrehîm Ezîz ku di avakirina Şaredariya Qamişloyê de xwedî kedeke mezin bû, Rewşen Mihemed Zekî, Fehed Ebdulezîz, Mûsa Azad Mûsa, Elî Bora, Cîhan Mûrad, Emîna Bîlal, Ferhad Ebdulezîz Osman, Elaedîn Ebdulîllah, Awaz Mehmûd Mihemed û Helebçe Xelîl ku ducanî bû, şehîd bûn.

12 sal li ser komkujiya Şaredariya Qamişlo derbas dibin lê heta niha jî êş û xemgîniya vê rojê di dilê endamên şaredariyê û gelê bajarê Qamişlo de weke roja bûyerê ye. Saziyên gel yên di 2012'an de hatin avakirin şaredarî bûn. Li ser bingeha pêwîstiyên gel ev sazî hatin avakirin û xizmeta gel dikirin. Şaredarî ne saziyeke leşkerî bû, saziyeke sivîl bû ku Kurd, Ereb û Suryan lê dixebitîn. Cara yekê bû ku çeteyên DAIŞ'ê saziyekê bi vî rengî dikirin hedef.

**Bi armanca qelskirina projeya demokratîk komkujî pêk hate**

Ji ber ku wê demê Rêveberiya Xweser nû hatibû îlankirin çeteya bi rêya êrişên xwe dixwestin rêveberiyê bişkînin û nehêlin kar û xebata wê dewam bike. Ev Rêveberî ji bo gelê Kurd û gelên herêmê gaveke dîrokî bû. Êrişa li ser Şaredariya Qamişloyê jî piştî ragihandina Rêveberiya Xweser bû. Armanca komkujiyê jî zelal bû, ji bo ku bawerî li herêmê nemîne, herwiha tirsê bikeve nava gel û destkeftiyên gel têk bibin. lê armanca wan pêk nehat.




Êrişên çeteyên DAIŞ`ê û şaneyên razayî heta niha nesekinîn û berdewam in, armanca van êrişan têkbirina aramî û ewlehiya gelê li herêmê ye. Di dema dawî de jî me dît binesazî, navendên xizmetguzarî û saziyên girêdayî Rêveberiya Xweser herwiha mala birîndara şervanên ku li dijî DAIŞ`ê şerkirin ji hêla dewleta Tirk a dagirker hatin hedefgirtin, tê tekezkirin ku Tirkiyê piştgiriyê dide DAIŞ`ê da ku armancên xwe li herêmê pêk bîne. Heta niha jî êrişên dagirkeriya Tirk berdewame dixwaze destkeftiyan pêk bîne û herêman dagir bike bi bikaranîna çeteyan ku niha li Bendava Tişrînê şer dikin.

Şaredariyê her salê di 11'ê Adarê de xebatkarên xwe yên ku di komkujiyê de şehîd bûn, bi bîr tîne. Herwihan ziyareta gorên wan dikin û mûman pê dixin.

Ji bo bîranîna şehîdan, Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo di 11`ê Nîsana 2014`an de li taxa Kornîş parkek bi navê Şehîd Helebçe vekir, di sala 2015`an de dayîngeha bi navê Şehîd Emîna hate vekirin, di 12`ê Nîsana 2016`an de baxçeyê zarokan bi navê Şehîd Awaz, parkek bi navê Şehîd Cîhan di 19`ê Nîsana 2016`an de hate vekirin û di 11`ê Adara 2019`an de navenda pêşxistina jinê bi navê Şehîd Rewşen hate vekirin.



# 'Pêwîst e rêxistinên mafê mirovan nebin hevkarên qirkirinê'

Rêveberiya Komeleya Mafê Mirovan ya Sûriyê Evîn Cuma diyar kir ku komên çekdar ên cîhadîst ku girêdayî desthilatdariya Şamê ne, li dijî elewiyan komkujiyan pêk tînin û wiha got: "Pêwîst e rêxistinên mafê mirovan nebin hevkarên zordariyê."

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Ji 6'ê Adarê ve ji aliyê cîhadîstên ku girêdayî desthilatdariya Şamê ya nû ne, li herêmên beravê li dijî elewiyan , bi hinceta "Bermahiyên rêjîma berê" komkujiyên dijmirovî pêk hatin. Di encamê de ji hezarî zêdetir kes hatin kuştin. Her wiha ewlehiya herêmê têk çû û bi hezaran kes ji bo ku xwe ji cîhadîstan biparêzin bi çola ketin û hin jî koçî Lubnanê kirin. Li gorî rewangeha mafê Mirovan ya Sûriyê ji 6'ê Adarê û heta kêliya amadekirina vê nûçeyê, li beravên Sûriyê ji aliyê komên çekdar ên cîhadîst ve 44 komkujî di derheqê elewiyan de pêk hatine, di encama wan de li gorî hatiye tesbîtkirin 1100 kes di nava wan de jin û zarok jî hene bi awayekî pir hov hatine kuştin.

Derbarê komkujiyên dijmirovî yên ku di derheqên elewiyan de pêk tê, Rêveberiya Komeleya Mafê Mirovan ya Sûriyê Evîn Cumaa ji Rojnameya me re axivî.



Evîn Cuma diyar kir ku komujiyiyên ku li ser sivlan tê kirin ne tiştekî nû ye û wiha got: "Komên çekdar yên girêdayê HTŞ`ê bi êrişên xwe yên dijmirovî komkujiyî li dijî elewiyan pêk tînin. Her wiha ev ne komkujiya yekem e ku em matmayî bimînin, ji destpêka kirîza Sûrî bi hezaran komkujî li ser sivîlan pêk hatin û her car jî dewletên cîhanê xwe kor û lal dikin. Belê em di roja îro de jî dibînin ku çawa komên çete yên girêdayî HTŞ`ê bi henceta bermahiyên rêjîma berê komkujiyên dijmirovî pêk tîne. Qaşo HTŞ`ê bi navê îslamê tevdigere û dixwaze di Sûriya nû de aramî û aşîtî ava bike, aceba aramî û aşîtiya ku behsê deke kuştina sivîlan e ku jin, zarok, kal û pîr bê navber bi dilekî sar wan dikujin. Ev di zagonan de sûcên pir giranin û hisabên wê jî pêwîste giran were dayîn. Êdî bila dewletên navneteweyî hisab bixwaze û bi taybet ev rêxistinên mafê mirovan û zarokan li ku ne, çima xwe bê deng dikin? Ji bo berjewandiyên xwe normal ku xwîna gel were rijandin, lê tenê bila tiştek bi berjewandiyên wan newe. Ev ne nîzîkatiyeke mirovî ye, pêwîste hisab ji van komên çete were xwestin."

**'Gunhê herî mezin bêdengî û nederxistna rastiyê ye'**

Evîn Cuma di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Komkujiyên ku li Sûriyê li hemberî civaka elewî hatine kirin, hovîtiya ku li hemberî jinan û zarokan hatî kirin, tenê şer nîne, dijminahiya mezhebê ye jî. Ev zihniyet mîna zilma ku duh DAÎŞ'ê li dijî Kurdan, Kurdên Êzidî, Xrîstiyan û gelek civakên baweriyên din pêk anî ye. Niha jî heman fikrê tarî careke din derketiye holê. bêdeng mayîn guneh e. Eger em îro bêdeng bimînin, sibe wê dora bawerî û gelên cuda jî were. Pêwîsta rêxistinên mafê mirovan nebin hevkarê zilmê, zalim kî dibe bila bibe em li dijî bisekinin. Li dijî vê hovîtiyê tevahî misilman, her kesê ku dibêje ez mirov im, mekanîzmayên mafên mirovan ên navneteweyî, saziyên dînî û her kesê xwedî wijdan divê têbikoşe. Divê ji bîr nekin ku ev bêdengî wê zilma li dijî civaka elewî mezin bike, em li dijî vê zilmê dengê xwe bilind bikin."




**'Pêwîste di aliyê zagonî de hisab ji van komên çete were xwestin'**

Evîn Cûma wiha domand: "Hêzên navneteweyî hewl didin HTŞ'ê li Şamê rewa bikin û herêmê li gorî berjewendiyên xwe ava bikin. Ji ber vê yekê hemû hêzên navneteweyî li pêşberî ewqas komkujî û zilma dijî mirovahiyê bêdeng dimînin. Ev desthilata paşverû û dijminê jinê ku îradeya gelên Sûriyê paşguh dike û bi polîtîkayên xwe yên komkujî û çewisandinê nikare siberojeke bi hêvî pêşkêşî gelên Sûriyê bike. Em bang li hemû saziyên mafên mirovan dikin û dewletên navneteweyî dikin ku li hemberî zilma li ser Elewiyan tê kirin xwe bê deng nehêlin û pêwîste di aliyê zagonî de hisab ji van komên çete were xwestin. Ev şer ne tenê li dijî gelên li Sûriyê û herêmê ye, li dijî hemû rûmeta mirovahiyê ye. Em hikûmeta cîhadî li Sûriyê û dewleta şerîetê ya ku ew temsîl dike red dikin! Li hemberî komkujiyên li Sûriyê em li cem civaka Elewî û hemû gelên bindest in. Em zilm û her cure terorê şermezar dikin."

# 'Tu kes nikare vîna gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bişkîne'

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Rojnamevan Zîlan Hemûş diyar kir ku bi direjahiya şoreşê û heya îro, gelê Eşrefiyê û Şêxmeqsûd rastî dorpêçê hatiye û got, "Civakê bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî li dijî rêjîmê û çeteyan li ber xwe daye. Wê tu kes nikaribe vîna gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bişkîne."**

Şêxmeqsûd û Eşrefiyê du taxên kurdan ên bajarê Helebê ne, dema ku Şoreşa Rojava dest pê kiriye xelkên her du taxan rastî zextên rêjîm û komên çete hatine.

Derbarê rewşa xelkên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, zexta ku dibînin hem jî li hemberî wê berxwedaniya civakê, rojnamevan Zîlan Hemûş ku li Şêxmeqsûd dijî ji rojnameya me re axivî.

**'Ji destpêka şoreşê ve Şêxmeqsûd û Eşrefiyê rastî zextê dihatin'**

Zîlan da zanîn ku ji destpêka şoreşê ve rêjîmê û komên çete zext li welatiyên Şêxmeqsûd û Eşerefiyê kirin û wiha got: "Dema ku behsa Taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê tê kirin, kelha berxwedaniya bi salan dikeve hizra me. Wekî em dizanin ku ji destpêka Şoreşa Rojava ve heta roja îro herdu taxên kurdan; Eşrefiyê û Şêxmeqsûd rastî êriş, şerê taybet, zext, ambargo û astengiyan ji derdor ve hatine. Di sala 2013'an de komên çete êrişî her du taxan kir, di wê demê de welatiyên Eşrefiyê û Şêxmeqsûd koçber nebûn, bi awayê Şerê Gelê Şoreşgerî bersiva êrişan dan. Herwiha sala 2016'an dîsa 28 tabûr çeteyan ji hemû aliyan ve êrişî gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê kirin. Di wê demê de civakê ji hêla leşkerî, parastina cewherî, siyasî, aborî û hwd… xwe bi rêxistin kirin û li taxên xwe berxwedaniyeke dîrokî kirin. Dema ku Efrîn hat dagirikin, beşek ji xelkên wê derbasî Helebê bûn û hin jî li Şehbayê man, di wê demê de tevahiya Helebê di destê rêjîmê de bû, ji bilî Eşrefiyê û Şêxmeqsûd. Lewma jî ambargoyeke mezin û giran ji hêla rêjîma Beisê ve li ser gelê kurd ên her du taxan dihat meşandin."



**'Bi guhertina rêjîmê re tiştek nehat guhertin'**

Zîlan Hemûş diyar ki ku bi ketina rêjîma Beis re tiştek nehate guhertin, ji ber ku her du bi yek hişmendiyê ne û wiha domand: "Rêjîmê bi siyaseta dorpêçiyê û qutkirina jêderên jiyankikirinê li ser gelên me xwest ku vîn û berxwedaniya civakê bişkîne û gel xwe teslîm bike. Lê di wan şert û mercên de yên ku gel tê re derbas dibû, berxwedaniyeke bêhempa hat meşandin. Bi taybet di mehên zivistanî de, gel ji debarên jiyanê, wekî sotemenî, xwarin, vexwarin, şîrê zarokan bêpar bûn, ev pirsgirêk jî her sal dubare dibûn. Rêjîma Beis, li dijî debarên jiyana gel disekinî, lê gelê me li hemberî vê yekê, li ber xwe dida. Piştî ewqas berxwedanî, rêjîm hilweşiya, rêjîm hat guhertin, Essed çû Ebû Mihemed Elcolanî hat, lê tiştek nehat guhertin. Ji ber ku niha hewldan hene ku komên çete weke Emşat û Hemzat bikevin Taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bikin û bixin bin kontrola xwe. Lê gelên me li gel hêza xwe, berxwedaniyek dan meşandin, parastina taxên xwe kirin û karîbûn vê êirşê vala derxînin. Sedem ew e ku bi ketina rêjîmê re civakê li her du taxan ketine seferberiyê û rewşa ewarte ragihandine, civak xwe ji hemû waran ve xwe bi rêxistin kir û piştgiriya hêza parastinê dike."

**'Tax taxên me ne, çi dibe bila bibe em dernakevin'**

Rojnamevan Zîlan Hemûş destnîşan kir ku Eşrefiyê û Şêxmeqsûd taxên kurdan in, wê li nik hêza xwe parastina axa xwe bikin û wiha axivî: "Bi dirêjahiya deh salên bûrî re çeteyan xwestin bikevin taxên me, hewl didan mîna kiriyarên li ser gelê Efrînê dan meşandin, li Eşrefiyê û Şêxmeqsûdê dubare bikin. Îroj heman yekê dixwazin, dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê dixwazin mîna Efrînê dagir bikin û kiriyarên xirab pêk bînin. Berî demekê me dît ku dewleta Tirk a dagirker êrişî bendeke kontrola Hêzên Ewlekariyê ya Eşrefiyê kir û di encamê de du endamên Asyîşê şehîd bûn û hinek din birîndar bûn. Tu kes nikare vîna gelê Eşrefiyê û Şêxmeqsûdê bişkîne. Îro gelê me biriyar daye li gel hêza xwe ji bo parastina taxên xwe bike. Ev tax taxên me ne, çi dibe bila bibe em ê li ser erda xwe bijîn û bi çi awayî be em ê ji taxên xwe dernekivin. "

# 12'ê Adarê roja serhildana gelê kurd li dijî zordariyê bû

12 Adara 2004'an gelê kurd li dijî zordariya rêjîma Beis serî hilda. Lîstikvan Qezafî Usmet da zanîn ku roja 12'ê Adarê ji bo gelê kurd rojeke xemgîn e û got, "Rêjîmê Beis qirêja siyaseta xwe xist nav giyanê sporê de û xwest fitneyekê di navbera kurd û ereban de çêke."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Di dîroka 12'ê Adara 2004'an de rêjîma Baas a têkçûyî komkujiyek derheqê gelê kurd li Stada 12'ê Adarê ya bajarê Qamişlo çêkir û di encamê de bi dihan kes şehîd û birîdar bûn. Ev bûyer di maça futbolê ku di navbera Tîma Cîhad a Cizîrê û Tîma Fitiwê ya Dêrazorê de pêk hat, dest pê kir.

Berî destpêkirina maçê re, alîgirên tîma Fitiwê sloganên nijadperestî yên mîna "Bijî Sedam Hisên, Rêberên kurd yên xayîn tune bibin" gotin û bi keviran êrişî alîgirên Tîma Cîhad û gelê kurd kirin.

Piştî êrişê hêzên rêjîmê bi fermana Parêzgerê Hesekê yê wê demê Selîm Kebûl, destwerdan kirin û gule li beşa alîgirên tîma Cîhadê reşandin. Ev rewş di dîmenên dezgehên çapemeniyê yên ku wê demê hatin belavkirin jî diyar bû. Di encamê de di gel 2 zarokan, 9 kes şehîd bûn.

Di encamê de Serhildana 12'ê Adarê ku li Qamişlo dest pê kir û li tevahiya Rojava, ji Dêrikê heya Efrînê û paytexta Sûriyê Şamê, serhildana gelê kurd dest pê kiir. Derbarê Serhildan û Komkujiya 12'ê Adarê, lîstikvanê kurd ê Tîma Cîhad Qezafî Usmet ku yek ji şahidê buyerê bû ji rojnameya me re axivî.





## 'Alîgirên Tîma Fitiwê kevirên reş xistibûn amûrên avê'

Usmet eşkere kir ku yekem car cemawerên Fitiwê bi tîma xwe re hatin û bi wan re kevir hebûn û wiha got: "Ez yek ji lîstkvanên Tîma Cîhad im, dema serê sibehê ez û hevalên xwe yê tîmê çûn Stada Şehîdên 12'ê me dît ku yekem car e gelê Dêrazorê li bajarê Qamişlo tevdigerin û di destên wan de wêneyên Sedam Huseyn hene. Berî niha matş di navbera me û heman tîmê de çêdibû, lê cemawerên Fitiwê nedihatin, vê carê hatin û em matmayî man. Dema ku me xwest derbasî stadê bibin, hêzên ewlekariya rêjîmê weke yekem car gelê Qamişlo tev kontrol kirin, hetanî xwestin çenteyên me vekin, bêyî ku cemawerên Fitiwê kontrol bikin. Dema ku ew derbas bûn, tirmizên avê bi wan re bûn, piştî ku êriş bi kevirên reş li ser gelê kurd hat kirin, me nas kir ku ew tirmiz dagirtî kevirên reş bûn. Me amadekariyên xwe kir da ku dest bi matiçê bikin, lê êriş ji hêla cemawerên Fitiwê ve li gel siloganên nijadperestiyê hat destpêkirin."

## 'Êrişên hovane heta heya 5'ê êvarê berdewam kir'

Lîstikvan Qezafî anî ziman ku êrşên rêjîmê li ser gelê kurd ji demjimêr 12 heya 5'ê êvarê domand û wiha axivî: "Destpêkê alîgirên Fitiwê di demjimêr 12'ê nîvro de êrişî alîgirê tîma me kirin, hêzên ewlekariyê jî li wan temaşe dikirin. Tevahiya gelê me kirin sêgoşeyekê de û dema ku milet dixwest xwe biparêze, leşkerên rêjîmê bi dar û keviran êrişî wan dikirin, lewma jî milet xwe ji pêpelûkan diavêtin erdê û birîndar dibûn. Li pêşiya min bi dehan kes birîndar bûn. Nêzî demjimêr 2'yan miletê me bi kotekî derket ji stadê, ewlekariyê hemû alîgirên Ftiwê di stadê de parastin, di wê demê de istixbarat, hêzên leşkerî û muhafizê Hesekê hat. Gelek kes li Stadê di nav destê rêjîmê û alîgirên Fitiwê de mabû, min nêzî 15 kesan ji nav destê wan xilas kirin. Piştî wê Li pêşiya Baxçê Giştî yê bajarê Qamişlo miletê me kom bûbûn, piştî nîvro êdî hêzên leşkerî bi guleyan êrişî, xelkê kirin, çi kesê li wir dikirin hedef û şehîd dixistin. Ev roj ji bo me rojeke gelek bi êş û nexweş bû. Êrîşa li ser miletê me heya berêvarî domand, ez û çend endamên tîmê yên biyanî bi aweyekî çûn malê, da ku zerer negihêje wan, min ew kes birin gel xwe."

## 'Rabûna gelê kurd li tevahiya Sûriyê hêz da me'

Qezafî Usmet bi lêv kir ku rabûna gelê kurd li hemû Sûriyê hêz da me ji bo serhildanê û wiha axivî: "Roja 13'ê Adarê de, em nêzî 600 kesî ji Taxa Hilêliyê derketin xwepêşandanê. Em çûn pêşiya Çerxerêya Peykerê Basil, me êrişî peyker kir û paşê çûn ber bi Taxa Enteriyê ve. Dema ku em gihaştin Enteriyê rêjîmê êrişî kombûna me kir, bi guleyan ew kombûn belav bû û her yek ji me bi aliyekî ve çû. Di roja 14'ê mehê de em dîsa derketin, li kolana Munîr Hebîb mîtîng li dar xistin. Wê kêliyê de dîsa rêjîmê êrişî me kir, di encamê de 3 kes li pêşiya min de şehîd bûn û gelek kes ji ling, dest û serê xwe birîndar bûn. Em ji wir reviyan û şehîdên me li erdê man. Rewşa êriş û xwepêşandanan nêzî sê heftiyan domand, her în em derdiketin qadan û xwepêşandan li dar dixistin.Gelên me li hemû bajarên Rojava, Şam û hwd... derketin serhildanê, vê yekê hişt ku coş û moralê me bilind bibe. Nexasim derketina Şêx Meişûqê Xiznewî ku şoreşek li dar xist."

## 'Rêjîmê xwest nakokiyan di navbera kurd û ereban de çêke'

Qezafî destnîşan kir ku rêjîmê xwest nakokiyan di navbera kurd û ereban de biafrîne, lê bi ser neket û wiha domand: "Wekî em dizanin berî niha em bi navê tîma xwe diçûn Dêrazorê, di maça de em bi ser diketin jî, gelê Dêrazorê tu astengî ji me re çênedikirin. Piştî ketin serokê Îraqê, Sedam Huseyn rêjîm xwest ku lîstkeke qirêj bimeşîne. Rêjîm ditirsiya ku di encama ketina Sedam de li Rojava rabin serhildanan û xwe ji Sûriyê qut bikin. Lewma ev komkujî bi serê kurdan pêk anî, wê demê xwest ku gelê ereb ji bo berjewendiyên xwe li hemberî gelê kurd bi kar bîne. Em nizanin dibe ku cemawerên Tîma Fitiwê ji istixbaratên rêjîmê bin û cilê sivîlan li xwe kiribin da ku pilana rêjam Beis bi ser bikeve û şerê navxweyî çêbibe. Lê şerê navxweyî bi saya hin kesên xwedî hişmendiyeke mezin lîstka qirêj a rêjîmê neçû serî, wan kesên aqilmend ji pêkhateya kurd û ereb destwerdan kirin."

## 'Hêviya me spor û jiyaneke aştiyane li Sûriyê ye'

Lîstikvanê goka piyan ê Tîma Cîhad Qezafî Usmet diyar kir ku hêviya lîstikvanên sporê û gelê kurd ew e ku bi tevahiya gelên Sûriyê re spor û jiyaneke hevbeş a aştiyane bijîn û wiha got: "Dema ku rêjîm hat hilweşandin, em gelekî kêfxweş bûn, gelê kurd di kêliyên azadiyê de jiyan kirin, bi taybet lîstikvanên futbolê. Ji ber ku berî rêjîm hilweşe gelek qeyd li ser lîstikvanên tîma Cîhad hebûn, rêjîmê nas dikir ku piraniya lîstikvanan kurd in astengî derdixistin pêşiya me. Me nikarîbû bi rehetî û dilekî xweş herin Şamê, wê demê çenteyên me vedikirin û tiştên me didizîn. Lê piştî ketina rêjîmê êdî wê ciwanên me û hemû lîstikvanên kurd dikarin bikaribin biçin hemû bajarên Sûriyê. Ev çar sal in ku maç li Qamişlo di navbera Tîma Cîhad û Fitiwê de tê çêkirin, gelê kurd û ereb ên vir û Dêrazorê li gel hev bi şadwerî li maçê temaşe dikin. Hêviya me ew e ku tevahiya gelan li gel pêkhateyên din jiyaneke hevpeş û aştiyane li Sûriyê bijîn."



## Kujerên berê û niha di zihniyetê de yek in!

**Dilyar Cizîrî**

Di roja 7'ê Adarê de li Berava Sûriyayê hin komên çekdar li dijî çekdarên HTŞ'ê êriş pêk anîn. Hejmarek çekdarên wan hatin kuştin. Piştî bûyerê HTŞ'ê êrişî gund û bajarên Tertûs, Laziqiyê, Hema û Humsê kirin, bêyî cûdayî di navbera sivîl, çekdar, zarok, jin û kalan de bikin komkujî pêk anîn. Li gorî belgekirina rêxistinên mirovî di nava 2 rojan de nêzî hezar sivîlên elewî hatin kuştin. Li gorî raporan hin kurd, xiristiyan jî hatin kuştin. Tişta balkêş kujer bi sûcên xwe kêfxweş dibûn, dîmenên xwe dikşandin û xwe wekî serkeftî nîşan didan. Li gorî dîman û hin çavkaniyan ji bilî kuştina bi zanebûn, işkence û biçûkxistina mirovan, destdirêjî, talan û şewata malan pêk hat. Ji dîmenên hatin belavkirin, hejmarek çeteyên kuştin dikirin, sembolên DAIŞ'ê li ser cilên wan hebûn. Di heman demê de hejmarek mezin a kujeran bi zimanê Tirkî diaxivîn. Li gorî çavkaniyan çeteyên Tirkistan, Eygor û her wekî din ji çeteyên El-Qaîda yên biyanî di nava kujeran de hebûn.

Ew dîmenên bi êş ku ji aliyê çekdarên HTŞ'ê bi navê Wezareta Beravaniyê ya Sûriyê bi hinceta şerê li dijî bermahiyên rêjîma berê pêk hat, li dijî hemû yasa û zagonên navdewletî ne. Rewşa li Berava Sûriyê tirajîdiya bi êş ya gelê Sûriyayê bi destê rêjîma Baas jiyan kiribû, careke din xwe dubare kir. Di vir de mirov dikare bêje ku tu cûdahî di navbera rêjîma Baas a berê ku 53 salan Sûriyê bi rêve dibir û hikûmeta Niha ya HTŞ'ê, çeteyên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên DAIŞ'ê de tune ye. Dibe navê wan ji hev cûda bin, dibe alên wan ne mîna hev bin û dibe di nava wan de şer derdikeve. Di nêzîkatî û zihniyetê de ji hev ne cûda ne. Şerê wan li ser desthildariyê ye û ji bo desthiladariya xwe dikarin her tiştî wêran bikin, mirovan qetil bikin û zarokan sêwî bikin. Di encamê de mijar ne mijara guhertina alekî yan kesane.

Mijar di zihniyetê de ye. Rewşa li Sûriyayê bêyî guhertina zihniyetê ne mumkine ber bi çareseriyê ve here. Ne HTŞ'ê û ne Ebû Mihemed El-Colanî bi van nêzîkatiyên xwe wê nikaribin aramî û ewlekariyê ji gelê Sûriyayê re pêk bînin. Berûvajî bi komkujiyên li Berava Sûriyayê isbat bû ku Colanî nikare bibe Ehemed El-Şerê nerim, wekî îda dike. Metirsî êdî ne tenê li ser civaka elewî heye, berûvajî niha metirsî li ser gelê Siwêda ku dirizî li wir jiyan dikin, zêde bûye. Di heman demê de metirsiya komkujiyan li dijî gelê kurd jî heye. Garantiya parastina wan niha hêzên wan ên leşkerî ne, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê QSD'ê û li Siwêda Meclîsa Leşkerî ya Siwêda ye.

Îro careke din isbat dibe li Sûriyayê ne mumkine sîstema navendî karibe ewlekarî û aramiyê li Sûriyayê pêk bîne. Berûvanî wê sîstema navendî metirsiya dûbare, sêbare û dehbariya komkujiyan li dijî gelê Sûriyayê zêdetir dike.

Ji ber wê erka hemû gelê Sûriyayê ye li dijî sîstema navendî têkoşîna xwe ya hevpar bi hêztir bikin û ji bo Sûriyaya nenavendî têbikoşin. Ji ber tekane riya çareseriyê nimûneya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye.



# 'Bi guhartina dengeyên sedsalî divê Tirkiyê pêvajoya nû qebûl bike'

Endamê Kongra Îslama Demokratîk Ebdulkerîm Saroxan da zanîn ku peyama Rêber Abdullah Ocalan ya aşitî û demokrasiyê pêvajoyekî nû di dîroka Tirkiyê de dide destpêkirin û divê Tirkiyê li gorî guhartina dengeyên sedsalî xwe saz bike.

**Esma Mistefa/ Qamişlo**

Piştî peyama Rêber Abdullah Ocalan ya aşitî û demokrasiyê ku di 27ê Sibatê de derketiye, helbet li pêşiya Tirkiyê bi giştî û bi taybet di doza gelê kurd de pêngavekî nû tê diyarkirin. Derbarê van mijaran de Endamê Kongra Îslama Demokratîk Ebdulkerîm Saroxan bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Hikumeta Tirkiyê banga Rêber Apo ya guhartin û veguhartina demokratîk çawa digire dest?**

Gelek alî li benda bang û peyama Rêber Apo bûn. Bi taybet hikumeta Tirkiyê. Niha di nava Tirkiyê de gelek alî hene weke partiyên muxalîf û yên li dijî hikumetê, ji ber wê jî pir alî li vê bangê meyze dikirin ku ka wê Rêber Apo çi bêje. Lê xuyaye ku Tirkiyê li hember vê pêvajoyê ne rihete. Heyanî niha rûxmî bangawazî li Tevgera Azadiyê PKK'ê ya çekdanînê hate kirin, lê dîsa jî Tirkiyê tu gavek erênî nîşan nedaye. Dema ku Rêber Abdullah Ocalan ev pêvajo dest pê kir, ew xwedî piroje û çareserî ye. Lê hikumeta Tirkiyê ne amade ye, ew weke ku ger vê bangawaziyê qebûl bike û bi kurdan re diyalog bike, wê tunebûn û lawaztiya xwe eşkere bike. Ji ber vê yekê jî Tirkiyê di vê mijarê de ne zalal e û bi dudilî nêzî pêvajoya aşitî û demokrasiyê dibe. Hikumeta Tirkiyê ji demokratîzekirina Tirkiyê ne amede ye.

**Bi banga Rêber Apo re xuyaye gelek nakokî di nava Tirkiyê de derketin pêş, ev nakokî çi ne û wê çawa bêne derbaskirin?**

Rêber Apo dema ev gav avêt, bi bawerî û bi îsrar got ku ew dikare vê pêvajoyê ber bi serkeftin û aşîtiyê ve bibe û çareseriyeke bingehî di navbera Kurd û Tirkan de pêşkêş kir. Êdî ev merhele wê ji bo gelê Kurd jî pêvajoyekî nû be û hin guhartin di aliyê danûstandinê de bêne çêkirin. Li gorî pêvajoyê divê Tirkiyê jî wisa bike. Rêber Apo di vê peyamê de helwesta gelê kurd li hember giştî cîhanê diyar kir û çawaniya nêzîkbûna Tirkiyê ji vê pêvajoyê re êdî li ser wan hêşt.

Helbet di nava dewletekî ku dijminê xwe tenê gelê Kurd dibîne, gelek nakokî û tevlîhevî jî derketiye holê. Beşek ku piştgiriya çareseriyê û demokrasiyê dike heye, beşek jî tam dijberin, radîkalin û van danûstandina qebûl nakin. Ger berê her du aliyên dijber li durî hev tevdigeriyan, niha mecbûrin ku li ser yek nêrînê werin gel hev û di pêvajoya nû de ji bo gelê Kurd lihev bikin. Di aliyekî din de jî şîrovekar û berpirisyarên dewleta Tirkiyê rewşa xwe ya niha di tehlûkeyê de dinirxînin ku Tirkiyê bi vê siyasetê dewam bike, wê di aliyê hundirîn û aborî de bifetise. Ev nameya ku ji aliyê Rêber Apo ve hatiye dayîn weke pêvajo û tecrûbeyekî nû di dîroka Tirkiyê de tê destgirtin. Ji ber ew her fêr bûne ku divê ew yên desthilatdar bin û di Tirkiyê de tenê yek nasname hebe. Lê di vê pêvajoyê de hemû denge hatine guhartin û divê xwe li gorî wê saz bikin.

**Piştî banga Rêber Apo, tevî ragihandina agirbestê ji aliyê PKK'ê ve, lê dîsa jî êrişên dagirkeriya Tirk li ser herêm û Qadên Parastinê nehatine rawestandin. Sedema vê yekê çi ye ?**

Ev yek xwe disipêre nehevgirtina di nava Tirkiyê de. Hin alî banga agirbestê weke lawaztiyê û tesfiyakirinê didin nîşandan. Hin ji wan jî dibêjin divê PKK'ê bi temamî ji holê were rakirin. Ji ber vê yekê hê jî êrişî Tirkiyê li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê û li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomin. Rûxmî ku Tevgera Azadiyê PKK'ê bi banga Rêbertî re pêvajoya çekdanînê pejirand û tenê wê mafê xwe yê parastina rewa bikar bîne.

Tirkiyê heyanî niha jî li hember banga Rêber Apo û pêngavên ku wê di demên pêş de werin destpêkirin ne amede ye û bi tirs e. Tirkiyê ji feraste û zihniyeta ku Kurd dijmin in nikare xwe rizgar bike. Ji lewra jî êrişên xwe nedane sekinandin bi tayebt herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyî bi giranî tê hedefgirtin.



**Tiştê ku dikeve ser Tevgera Azadiyê û Rêber Apo de hate kirin, lê tişta li ser milê Tikriyê çi ye û divê çawa tevbigerin da ku ev pêvajo bi encam bibe?**

Bi banga Rêbertî re tavahî gelê Kurd û Tevgera Azadiyê peyama Rêbertî qebûl kirin û li gorî wê yekê wê gavên siyasî û leşkerî bavêjin. Bê guman ev yek jî li ser asta Kurdistanê di giştî ragihandinê de hate dîtin. Piştgiriya pêvajoya nû û pêşwazîkirina PKK'ê ji banga Rêber Apo re li ser tavahî ragirhandinê hatin eşkerekirin. Lê di aliyê hikumeta Tirkiyê de tiştek nehat xuyakirin. Ger Tirkiyê ji vê pêvajoyê re erê dike divê derkeve û bi daxuyaniyekê vê yekê eşkere bike. Ya sereke da ku ev pêvajo bigihîne encamê ji xalên herî bingehîn divê Rêber Abdullah Ocalan bi maf û hiqûqa xwe tevbigere û ji zîndanê serbest were berdan. Ji ber Rêber Apo tenê dikare vê pêvajoyê bi rêvebibe û ber bi asoyên aştî û demokrasiyê ve bibe.Yê li ser me jî em weke şopînerê vê pirojê û xetê li beyam û xeta ku rêbertî û tevgera Azadiyê daye diyarkirin xwedî lê derkevin.

## Li dijî demogojiyê têkoşîneke bîrdozî ya bi bandor pêwîst e



**Zekî Bedran**

Sûriyê niha jî bi qirkirina Elewiyan di rojevê de ye. Berpirsyarê vê qirkirinê teqez HTŞ'ê ye. HTŞ'ê nikare çi hêzên din tometbar bike. Li ber çavê hemû cîhanê ragihandibûn ku komên çekdar çekberdan e û artêşa ku ava dikin dê tevlî wan bibin. Ev komên ku êrîş li ser Lazkiyê û herêmên din kirine ne bi serê xwe ev kiryar pêkanîn e. Di heman demê de jî Ehmed Şera jî ev pejirandî ye. Niha jî NY, DYA, Fransa û Elmanya jî wan qirkirina şermezar dikin û daxwaz dikin wana bên dadgeh kirin. Kê berpirsyar e? Ji derveyî HTŞ tu hêz ev kiryar pêkneanîne. Wan hêzan bang kir ku cîhan giştî hebûna HTŞ'ê bipejirîn e. Bi şêwazekê Sûriyê radestî HTŞ hat kirin, di mijara HTŞ de nakokî û pirsên wan hen e. Ji ber wê yekê ji listeya terorê dernexistin. Ev embargoya li ser Sûriyê bi gelemperî hîn berdewam dik e. Ruxmê vê jî dorberê xwe hemû ji aliyên HTŞ ve bikaranîn. Wiha difikirin ku dê HTŞ'ê biguherin û bikin di bin serweriya xwe de.

Îsraîl ev hizirandina bi wî awayî nepejirand. Bi gotina HTŞ'ê çeteyekî terorîst e û naxwaze hêz û dewleteke bi vî rengî li ser sînor bi cîh bibe, operasyonên leşkerî pêk aniye û herêmên xwe yên dagirkeriyê berfireh dike. Hemû binesaziyên leşkerî û cebilxaneyên li Sûriyeyê ji aliyê Îsraîlê ve tên xistin. Hejmara leşkerî ya Sûriyê ji holê tê rakirin. DYA û Ewrûpa dixwazin HTŞ di desthilatdariyê de bibînin. Çalakiyên wan vê yekê nîşan dide. Balkêş e, her çend HTŞ rûyê xwe yê rastîn eşkere kir jî, wan hîn jî helwesta xwe neguherandiye. HTŞ'ê bi kadroyên xwe hikûmet ava kir. Komên çekdar Ehmed Şera weke serok hilbijartin. HTŞ'ê desteya amadekar a kongreya neteweyî vesaz kir. Tevî ku di kongreya neteweyî de hêza nûnertiya gel tinebû jî, DYA û Ewropa ev yek taloq nekirin û helwest nîşan nedan. Kongre tenê ji wan kesên ku HTŞ vexwendibûn pêk dihat. Nûnertiya gel û hêzên rêxistinkirî nake. Hemû hêzên rêxistinkirî ji derve hatin hiştin. Makezagon peymanên civakî ne. Divê piştgiriyek beşên berfireh ên civakê hebe. Divê di navbera rewşenbîr, partiyên siyasî û raya giştî de nîqaşên berfireh bên kirin. Ji bo lihevkirineke neteweyî pêk were divê hemû derdor beşdarî nîqaşan bibin. Lê ev yek li Sûriyê pêk nayê. HTŞ'ê jî desteyekî ji bo amadekirina makezagonê destnîşan kir. Eşkere ye ku HTŞ dê li gorî nêrînên xwe zagonan amade bike. HTŞ feraseta demokrasiyê bi kar nayîne. Tişta ku em dibînin ew e ku ew hewl didin dewletek bi hişkî navendî û li ser bingeha olê ava bikin. Partiya Baas li ser neteweperestiya Ereban ava bû. Niha rejîma Baas bi dawî bûye, lê HTŞ'ê pênaseya komara erebî ya Baasê girtiye ser xwe, ku qaşo li dijî wê bû. Bi zêdekirina navê olê li ser vê, dide xuyakirin ku ew rejîmek otorîter a hişktir û pir navendî ava dike. HTŞ desthilatdariya xwe li ser hişmendiyekî yên li ser neteweperestî û ola Ereban bingeh digire. Tevî ku ev rastî niha derketine holê jî, NY û hêzên rojavayî li hemberî van kiryaran bêdeng in.

Weke me got HTŞ'ê li dijî demokrasiyê ye. Ew civakek rêxistinkirî naxwaze. Ber bi avahiyeke dewleta paşverû ya ku ji demê dûr ketiye, bi rêgezên olî yên tund û pêkhateyên bîrdozî ên neteweperest ve diçe. Vebijêrkên demokratîk ên ku gel xwe bi xwe birêve dibe, ji holê radike. Li gel vê jî demagojiyeke hovane dike. Êca çi dibêjin, her kes wê di Sûriyeya nû de bigihêje mafên xwe! Çi gotinek balkêş e! Ew ê çawa van mafan bi dest bixe? Ji gel nayê xwestin ku beşdarî pêvajoyê bibe. Civakek rêxistinkirî jî nayê xwestin. Rêxistin û têkoşîn tine, lê maf wê bên girtin! Di cîhanê de tiştekî wiha tine ye. Maf teqez bi hêz û têkoşînên rêxistinkirî dikarin bên bidestxistin. Gelo divê her kes vê pirsê ji xwe bike ka dê gelên Sûriyê çawa bigihêjin mafên xwe? Rêyên lêgerîna edaletê hene? Binesaziya zagonsaziyê ya civaka demokratîk pêk tê? Makezagonek demokratîk tê amadekirin, hêzên rêxistinkirî bi bandor in? Na, yek ji van tune. HTŞ'ê li dijî civak û pergala zagonî ya piralî û demokratîk e. Tevî vê yekê jî bi gotina wê her kes wê bigihêje mafên xwe, raya giştî ya navxweyî û derve dixapîn e. Maf çi ne, kî wan diyar dike, pênaseya wan dê çawa be? Ev hemû ne diyar in. Bê guman ew ê HTŞ wan mafan destnîşan bike, diyar dike û bide. Sûriyeya ku ji hişmendî û insîyatîfa HTŞ'ê re hatiye hiştin tu carî piralî û demokratîk nabe. Sûriyeya ku HTŞ'ê tenê ji ber Elewîtiya wê êrîş dike û qetlîaman dike, nikare bibe welatê azadiyê. Rejîma yêkdest û despotîk HTŞ'ê li şûna Baasê digire. Çapemeniya ku di destê rejîmê de bû niha di destê HTŞ'ê de ye. Di van dezgehên ragihandinê de hawirdora nîqaşê heye? Ji deng û ramanên cuda re vekirî ye? Na. Her ku HTŞ xurtir bibe û li ser dewlet û civakê serdest bibe, teqez wê zext hîn zêdetir bibin. Ger HTŞ hîna li ser hemû Sûriyeyê serwer nabe û bingehê wê ya girseyî qels e, têkoşîneke bîrdozî ya xurt û bi bandor neyê meşandin, wê sibê ji bo kesên demokrasiyê dixwazin pir dereng be. Pêwîste gel were perwerdekirin û zanebûna wan bê xurtkirin. Demokrasî di heman demê de jî têkoşîn û afirandina civakeke birêxistinkirî ye. Kes azadî û demokrasiyê pêşkêşî gel nake. Yên li demokrasî û azadiyê digerin bila bibin yek û li yek eniyê kombibin.



## Niyetên Xirab

**Farûk Sakik**

Nîqaşên piştî banga Rêber Apo bê navber dewam dikin. Herkes û her alî li gor xwe şîrove dike. Peyvek, gotinek, daxwiyaniyek, niyetek, texmînek tê gotin û herkes li dora vê yekê diçe û tê.

Bi awayek wisa tê nîqaşkirin û nirxandin, êdî naveroka bangê di navde winda dibe. Mixabin nameya-banga Rêber Apo bi daxwiyaniya Sirri Sureya Onder û Devlet Bahçelî tê nîqaş kirin. Guhertina têkoşîna Kurdan (ya 4 parçeyî) danîn aliyekê bi tenê Rojava tê nîqaşkirin.

Ka bibêjin di vê guhartina têkoşînê de Rojava jî heye an na. Lê herkes behsa çek danîna QSD'ê dike. Ev xetere. Dewleta Tirkiyê di vî şerê ku sed sale li dijî Kurdan pêkanî de, di têkçûna xwe de dixwaze serkeftinekê biafrîne. Nîyeta Rêber Apo ya fedekarî suîstîmal dike. Çawa ku bapîrên wan di dîrokê de li hember Kurdên serhildêr, peyva "eşqiya" bikardanîn ew jî îroj bê rawestandin peyva "teror-terorîst" bikartînin. Ezê teror û eşqiyatiya dewlata Tirk a dîrokî rêz nekim. Rêber Apo got divê zimanê pêvajoyê, zimanê aşitiyê be.

Ji bo mêjiyê civakê şêlo mêlo nebe, hin naveroka banga Rêber apo rêz bikim. Ev bang di heman demê de bangek ku berpirsyarî dide pêş dewletê jî. Divê herdu alî li gor vê peymanê-lihevkirinê tevbigerin. Aliyê dewletê her tişt-berpirsyariya xwe daye aliyekê û bi tenê berpirsyariya Kurdan derdixe pêş. Têkoşîna PKK'ê li çar aliyên Kurdistan bû û hemû Kurd di vê têkoşînê de cîh girtin.

Ji bo vê yekê, ev bang ji bo herkesî ye. Rojava û statuya Rojava jî di vê bangê de ye. Diviya li Rojava jî li gorî konjuktora demê guhertinên nû çêbibûna. Guhertinên her parçeyî bi rejima wî parçeyê re çareser bibuya. Rojava jî dibe ku bi rejima Şamê re li gor perspektifên Rêber Apo li çareseriyek bigeriya. Çek berdana QSD'ê di rojevê de nîne. Ha divê ku hatiba gotin ku dema bi Sûriyê re hat çareserkirin, hin hesasiyetên Tirkiyê bigirin berçav. Ji bilî vê yekê li Rojava xwestina çek danînê tiştek tuneye. Trajediya li herêma Elewiyan li berçavane, yên bê çek wê heman qederê bijîn. Ji bo vê yekê 'çekên Rojava' pîroz û ewlekariya heremê ye. Yên dixwazin QSD'ê çek berde jî dizanin ku tu carî ev yek ewê nebe. Em baş dizanin ku Rojava ji bo Rêber Apo xeta sor e. Di pêvajoya Kobanê de em bûn şahidê mudaxelaya wê. Îro jî ev biryardarî û israra wî ya parastina Rojava dewam dike. Divê kes bi wan gotinên tên nîqaşkirin, bi bandor nebe. Bi wan nirxandinan bawerî neyne. Rayadarên rêveberiya xweser jî dibêjin ji Rêber Apo daxwazek bi vî rengî nehatiye. Desthilatên Tirkiyê di navde Erdogan jî heye bi salane cîvaka Tirk li hemberê Kurdan jehrî dikin. Ji bo xwe serketî nîşan bidin wê bikevin nava van hewldanan. Kurdên ku bi banga Rêber Apo derbasî qonaxek nû bûn divê dewletê ji nêzîkde bişopînin û taciz bikin. Zextan bidin da ku pêşî li statuya Rêber Apo vebikin. Dema wan behsa têkçuna tevgera azadiyê kir, divê Kurd jî derewên wan teşîr bikin û behsa têkçûna wan ya eskerî, siyasî, civakî û aborî bikin. Herî dawî bi daxwiyaniya Devlet Bahçelî hin kes dibêjin ev pêvajo bi dawî dibe. Ne, berevajiyê vê yekê kontrol bi temamî di bin însiyatîfa Rêber Apo de ye. Ewê di derbarê qedera vê hemleya sîyasî de biryar bide. Hetanî ku Rêber Apo nebêje ev pêvajo sekinî, tu kes nikare bide seknandin. Gotina herî dawî ewê bibêje.